گۆڤارا زانستێن مرۆڤایەتی یا زانکۆیا زاخۆ
مجلة العلوم الانسانية لجامعة زاخو
Humanities Journal of University of Zakho (HJUOZ)
Vol. 9, No. 4, pp. 976–990, December-2021.
hjuoz.uoz.edu.krd
p-ISSN: 2664-4673
e-ISSN: 2664-4681
journals.uoz.edu.krd

# Di Berbanga Avabûna Iraqê da Milmilaneya di Navbera Nestorîyan (Aşûrîyan) û Keldanîyan

Yaşar KAPLAN*
Akademîsyen, Zanîngeha Hakkari, Fakulteya Îlahiyatê, Beşa Dîroka Ayînan

*Received: 09. 2021 / Accepted: 11. 2021 / Published: 12. 2021* https://doi.org/10.26436/hjuoz.2020.9.4.766

**Kurte**
Di komelgeha Iraqê da Mesîhî pêkhateyeke girîng in. Mesîhîyên Iraqê ji kevin da niştecihên Mezopotamyayê ne. Mesîhîyan hem digel xelkê Iraqê hem jî digel xelkê Kurdistanê peywendîyên tarîxî, sîyasî, çandî û civakî hene. Vê komelgehê di avabûna Komara Iraqê da û di rêveberîya sîyasî ya despêkê ya Komara Iraqê da roleke muhîm gêraye. Wekî tête zanîn komelgeha Mesîhî ya li Iraqê û Kurdistanê ji du kenîseyên bi navê Kenîsa Aşûrîyên Rojhilatê (Nestûrî) û Kenîsa Keldanîyan Katolîk yên xudan hizr û boçûnên cuda pêk dihêt. Kenîsa Keldanîyan her di Serdemê Osmanîyan da li Wîlayeta Mûsilê û Kenîsa Aşûrîyên Rojhilatê li Wîlayeta Wanê Sencaqa Hekarî niştecih bûn. Kenîsa Keldanîyan di bin nüfuza Dewleta Frensî û Kenîsa Aşûrîyên Rojhilatê jî di bin nüfuza Dewleta Brîtanyayê da bû. Di nîva sedsala 19 were milmilaneyeke berbiçav di navbera herdû kenîse û komelgehan dest pê kirîye û dewletên zilhêz jî li dû sîyaseta xwe beşdarî di vê milmilaneyê da kirîye. Di vê xebatê da dê kar li ser di berbanga avabûna Iraqê da peywendî û milmilaneya di navbera herdû kenîseyan û komelgehan da bête kirin. Herwesa dê îşaret li binyadê arîşeyên di navbera pêkhateya Mesîhî yên piştî avabûna Komara Iraqê jî berdewam kirî, bête dan. Di vê vekolînê da dê pitir îstîfade ji belgenameyên Osmanî bête wergirtin.
**Peyvê Sereke:** Keldanî, Nestorî, Aşûrî, Mesîhî, Iraq

## Destpêk

Li dû jêderên Suryanî/Aramî, Mesîhîyatî di dawîya sedsala 1ê û destpêka sedsala 2yê ji Çemê Firatê derbaz bûye û gehiştîye alîyê Rojhilatê. Lê belê derbarê Mesîhîyên Rojhîlatî agahîyên pêbawer di destpêka sedsala 3yê wê ve peyda dibin. Yên bûne Mesîhî her çend piranî Suryanî/Aramî jî bin her wesa gelek milet û xelkên dî jî bûne peyrewên Mesîhîyatîyê. Mesîhîyên Rojhilatî, ji destpêka sedsala 5an pê ve li Paytextê Sasanîyan (224-651) Ktesifon-Selucia (Medaîn) bi navê “Kenîsa Rojhilat” an jî “Kenîsa Persan” kenîseyek ava kirin û ev kenîse ji layê dewletê ve bi awayekî resmî hate qebûlkirin. Kenîsa Rojhilat, di gengeşî û munaqeşeyên di cîhana Mesîhîyan yên da di sedsala 5 û 6an derbarê şexsê Îsa Mesîh da rûdayî, jiber hizr û bîra xwe ya dyofîzîtî (dutebî’etî), ji alîyê dijberên wê yên Monofîzît (yektebî’etî) wekî Nestûrî hatin binavkirn. Piştî belavbûna Îslamê, Kenîsa Rojhilat keftîyê jêrhukmê Muslimanan. Di serdemê ‘Ebbasîyan (750-1258) da vê kenîsê bi saya mîsyonerên xwe yên jîr û zana şîyaye Mesîhîyatîyê bigehînît erdnîgarîya Asya, Çîn û Hindîstanê. Di wî serdemî da ev kenîse bi firewanîya xwe ve ji kenîseyên dî yên Mesîhîyan gelek mezintir bûye. Lê belê piştî hatina Moxolan bo Rojhilata Navîn, Kenîsa Rojhilatê ber bi lawazbûnê ve çûye. Piştî vê heyamê roj bi roj biçûk bûye û di sedsala 16an wê ve xwe li sêgoşa Gola Wanê-Ûrmîye-Musilê vegirtîye (Abona, 2002; Vine, 1937; Baumer, 2009; Habbi, 2013; Kaplan, 2021).

Heta nîva sedsala 19an piranîya Mesîhîyên bermayên Kenîsa Rojhilat (Nestûrî) di bin

* Corresponding Author.

hukmê mîrên Kurdan yên wekî Hekarî, Bahdînan û Botan da dijîyan (Campanile, 2009, 18-38). Piştî helweşandina desthilatdarîya mîrên Kurdan, Mesîhîyên Osmanî li wîlayetên Wanê, Mûsilê û Sêrt-Mêrdîn-Dîyarbekîrê û Mesîhîyên İranê jî li derdora bajarê Ûrmîyê niştecih bûn. Kenîsa Rojhilatê jiber çend egeran di serdema Osmanîyan, dabeşî sê petrîkîyan bibû: Petrîkîya Elqoş (Elîyaî), Petrîkîya Dîyarbekir (Yûsifî) û Petrîkîya Koçanis (Şem'ûnî). Petrîkên Elqoş û Koçanisê ji yek binemalê bûn û ev binemal wekî "Abona" an jî "Beytî Ebewî" dîhate nasîn. Petrîkên van herdû kenîseyan di nava vê malbatê da bi usûlê werasetê dihatin helbijartin (Abona, 2008, 31-39, 59-80; Mooken, 2003, 32-37). Van herdû petrîkîyan kevneşopîya Kenîsa Rojhilatê (Nestûrî) berdewam dikirin. Li hemberî vane Petrîkîya Dîyarbekirê girêdayî Kenîsa Romayê bû. Petrîkên li Dîyarbekir û Elqoşê di nava sîstema îdarî ya Osmanîyan da cihê xwe girtibûn û peywendîyên wan yên bi dewletê ve li ser Kenîseya Ermenîyan dihate birêvebirin (Seyfeli, 2005, 82-84; 2018, 92, 101). Beramberî vê çendê Petrîkîya Koçanisê heta nîva sedsala 19an di nava sîstema îdarî ya Osmanîyan da bi cih nebûbû û hetta Dewleta Osmanîyan heta hîngê nezanîye kû li Koçanisê petrîkîyek heye. Kenîsa Koçanisê, yekser girêdayî mîrên Hekarîyê bû çi peywendîyên wê bi Osmanîyan ra çênebûne. Di nîva sedsala 19an da piştî hatina mîsyonerên Rojavayî û seferên Bedirxan Begê mîrê Botan, Kenîsa Koçanis kefte rojeva Dewleta Osmanî. Piştî hîngê ev kenîse bi navê "Taîfeya Nestûrî" an jî Milletê Nestûrî" di nav belgenameyên Osmanî da tête dîtin. Petrîkê Kenîsa Koçanis bi navê "Reîsê Ruhanîyê Nestûrîyan" hatîye pênasekirin. Herwesa di salnameyên Dewleta Osmanî da, hîç behsê vê kenîseyê nehatîye kirin (Kaplan, 2020, 255, 264-265). Ji van agahîyan dîyar dibît kû berî nîva yekê ya sedsala 19an haya Dewleta Osmanî bi vê kenîsê nebûye. Di sala 1830ê Petrîkîya Elqoş û Petrîkîya Dîyarbekir bi navê Kenîseya Keldanîyan ya Katolîk bûne yek kenîse û navenda xwe înane bajarê Mûsilê. Ev kenîse girêdayî Kenîseya Romayê ma (Murre-van den Berg, 2009, 155-157). Bi vî awayî di destpêka sedsala 20an da du petrîkîyên Mesîhîyên bermayê Kenîsa Rojhilatê hebûn: Petrîkîya Keldanîyan (Mûsil) ya ser bi Katolîkên Romayê û Petrîkîya Koçanisê (Hekarî). Petrîkîya dawîyê, kevneşopa Kenîsa Rojhilatê (Nestûrî) berdewam dikir. Berî destpêka Şerê Cîhanê yê Yekemîn Petrîkîya Koçanisê nêzîkî 120.000 hezar endam û Petrîkîya Keldanîyan nêzîkî 100.000 endam hebûn (Wilmshurst, 2000, 363, 370).

**Mîsyoner û Mesîhîyên Rojhilatê**

Di destpêka sedsala 19ê wê ve mîsyoneran li nava Mesîhîyên Rojhilatê dest bi xebatan kirin. Xebatên mîsyoneran ji du qonaxên cûda pêk têt. Qonaxa yekê salên di navbera 1830 û 1850an vedigirît. Lê belê jiber şer û lêkdanên mîrên Kurdan û Dewleta Osmanî rewşa Kurdistanê ji alîyê emnî ve têkçû. Jiber vê çendê mîsyoneran xebatên xwe rawestandin. Piştî Peymana Berlînê (1878) Dewleta Osmanî qebûl kir ku jibo hemwelatîyên xwe yên Mesîhî dê hinek çaksazîyan biket, qonaxa dûyê (1880-1914) ya çalakîyên mîsyoneran dest pê kir (Verheij, 2014, 79-93). Di vê serdemê da taybetî hejmareka zêde ya mîsyonerên Ingilîz, Frensî, Emrîkî û Rusî dest bi xebatên xwe kirin. Her yek ji van li dû polîtîkaya dewleta xwe û kenîseya xwe bizav dikir. Li nav mîsyoneran da mîsyonerên Ingilîz cihekî taybet hebû. Deverên Mesîhî lê dijîyan jibo Ingilîzan gelek stratejîk bûn. Ingilîzan taybetî jibo parastina kolonîya xwe Hindîstanê, Kurdistan wekî çeperekî didîtin. Ji alîyê wan ve divêt rê li ber Dewleta Rûsî bête girtin da ku ew li ser Kurdistanê ra derbaz nebin û rêka Hindîstanê negirin. Jibo vê çendê Ingilîzan li hemberî Rûsan harîkarîya Dewleta Osmanî dikir û dixwest otorîteya merkezî ya Osmanîyan li vê herêmê bête qayîmkirin (Verheij, 2017, 382). Ingilîzan, berê Mesîhîyan dida hindê ku di şerên Kurdan yên hemberî Osmanîyan da harîkarîyê neden Kurdan û digel Osmanîyan peywendîyên xwe baş biken (Heazell, 1913, 164-165). Herwesa li sala 1886ê li bajarê Ûrmîyê ji alîyê Ingilîzan ve navendek bi navê "Archbishop of Canterbury's Assyrian Mission" hate avakirin. Armanca vê navendê perwerdekirina Mesîhîyan, çapkirina pirtûkan û diristkirina peywendîyên baş digel Nestûrîyan bû (Mooken, 2003, 69). Mîsyonerê Ingilîz yê bi navê William Henry Browne, li Koçanisê hatibû wezîfedarkirin û ew ji bîst salan pitir heta sala mirî 1913ê li wê derê ma. Polîtîkaya Ingilîzan ji mîsyonerên dî cudatir bû û wan bizav nedikirin kû mezhebê Mesîhîyên

deverê biguhorin û wan bînin li ser mezhebê xwe. Mîsyonerên Emrîkî pitir bizav dikirin kû Mesîhîyên deverê bînin li ser mezhebê xwe û wan bikin Protestan (Verheij, 2017, 382; Mooken, 2003, 69). Mîsyonerên Rûsî taybetî Mesîhîyên li derdorên Ûrmîyê kiribûn Ortodoks. Ji xwe Kenîsa Keldanîyan ya Mûsilê girêdayî Kenîsa Katolîk ya Romayê bû. Dewleta Frensî bi rêka mîsyonerên Lazarîst û Domînîk çalakîyên xwe xurt kiribû û dixwest bi şiklekî Kenîsa Koçanisê jî tevlî Kenîsa Keldanîyan bikin (Mooken, 2003, 69). Di vê rewşê da taybetî li nav Mesîhîyên di nav sînorên Osmanî da (Wan û Mûsil) milmilaneyeke xurt di navbera mîsyonerên Ingilîz û Frensî peyda bû. Vê çendê kartêkirin li ser Koçanis û Mûsilê jî kir û herdû kenîseyan hemberî hevdû dest bi çalakîyan kir.

**Petrîkîya Keldanîyan ya Mûsilê**

Piştî petrîkê dawîyê yê Petrîkîya Dîyarbekir Augustîn Hîndî li sala 1828ê mirî, kesek nema şûna wî bigirît. Li ser vê çendê Petrîkîya Dîyarbekir û ya Mûsil/Elqoş li ser daxwaza Papa Piusê VIII ve bû yek petrîkxane û Yuhanna Hurmiz (1830-1838) wekî Petrîkê Keldanîyan yê nû hate helbijartin. Bi rastî Romayê nedixwest Yuhanna Hurmiz bibît petrîk. Jiber ku ew endamê malbata “Abona” an jî “Beytî Ebewî” bû û Romayê dixwest di vê petrîkîyê da usûla werasetê bête rakirin. Piştî mirina Yuhanna Hurmiz, li şûna wî Nîqolas Zî’a (1838-1847) wekî petrîkê nû yê Keldanîyan hate helbijartin. Bi vî awayî piştî Yuhanna Hurmiz, sîlsîleya petrîkan yên ji binemala “Abona” yên devera Mûsil û Elqoş xelas bû û usûla werasetê bi dawî hat (Abona, 2008, 103-124; Mooken, 2003, 35). Di vê pêvajoyê da hinek endamên Petrîkîya Keldanîyan xwestin ji bin hukmê Romayê derkevin û dîsa wekî berê serbixwe bibin. Li dû agahîyên mîsyonerên Ingilîz petrîkê nû Nîqolas Zî’a li Mûsilê bernîyas nîne û mumkîn e bi rêka birazê Yuhanna Hurmiz, Mar Elîya Petrîkîya Keldanîyan bête kêşan bo layê Birîtanya (Mooken, 2003, 55-56). Lê taybetî Petrîkîya Keldanîyan di serdema Petrîk Yusuf Awdo da (1848-1878) karîgerîya binemala “Abona” yekcar li ser Keldanîyan kêm kir û jibo firawankirina kenîsa xwe li ser Petrîkîya Koçanisê pitir bizav kir. Herwesa peywendîyên xwe digel Dewleta Osmanî jî xurt kirin. Bi xwe Yusuf Awdo yekemîn petrîkê Keldanîyane ku navê wî li salnameyên Osmanî hatîye qeydkirin (Seyfeli, 2018, 99). Yusûf Awdo wekî petrîkekî ektîf û zîrek tête nasîn. Wî çalakîyên xwe li nav Mesîhîyên deverên Amêdîyê û Akrê zêde kirin û gelek Mesîhîyên Nestûrî yên ser bi Petrîkîya Koçanisê înana ser Petrîkîya Keldanîyan (Mooken, 2003, 36). Papa Piusê IXê li sala 1869ê bi rêka Yusuf Awdo, Petrîkê Koçanisê Mar Şem’un Rûel, vexwende Konsîla Vatîkanê ya Yekemîn. Her çend Mar Şem’ûn Rûel dixwest beşdar bibît jî lê belê babê wî nehêla ew beşdar bibît (Abona, 2008, 133-134). Yusuf Awdo di Konsîla Vatîkanê da gotarek derbarê heq û îmtîyazên Kenîsa Rojhilatê kir. Yusuf Awdo di sala 1876ê ji alîyê Papa ve bi aforozkirinê ve hate tehdîtkirin. Li ser vê çendê Awdo lêborîna xwe ji Papa xwest (Mooken, 2003, 36-37). Ji vê çendê dîyar dibît ku Kenîsa Katolîk ya Vatîkanê rê nedida Kenîsa Keldanîyan serbixwe bît an jî taybetîyên xwe biparêzît. Piştî Yusuf Awdo, Mar Elîya Abû el-Yonan (1879 - 1894) bû petrîkê Keldanîyan. Kenîsê di vê serdemê da her çend îstîqrareke baş vegirtibît û xebatên girêdana Nestûrîyan bo ser bi Petrîkîya Keldanîyan da pêşkeftibît jî tûşî dubendîyekê bû. Di vî serdemî da Metran Yuhanna Melus digel komeke metranan ji Kenîseya Keldanîyan veqetîya. Li dû agahîyên mîsyonerê Ingilîz Riley dema 1887ê seredana Mûsilê kirî, piranîya Keldanîyên deverê ji Vatîkanê veqetîyane û di bin rêveberîya Yuhanna Melus cema’eteke serbixwe ava kiribûn (Heazell, 1913, 10-11). Melus û hevalên xwe li sala 1887ê murace’etî Dewleta Osmanî kirin û daxwaz kirin ku bi navê Keldanîyên Şerqê wekî kenîseyeke cuda bêne nasîn û qebûlkirin (BOA, MV.00015; BOA, A.MKT.MHM. 493.14.1-2). Lê wesa dîyar e daxwaza wan bi cih nehatîye. Piştî el-Yonan, ‘Ebdyeşû’ Xayyat (1894-1900) bû petrîkê Keldanîyan. Lê belê geşedana Petrîkîya Keldanîyan taybetî li serdemê Emanûel Tûma (1900-1947) pêk hat. Di vê serdemê da Petrîkîya Keldanîyan şîya li Hekarîyê du metranên ser bi Kenîsa Koçanisê bikete Katolîk û bi kenîsa xwe ve girê bidet. Herwesa di vê fetrê da asta rewşenbîrî li nav Keldanîyan gelek pêş keft û kesayetên wekî Adday Şêr, Thomas Awdo, Eugene Manna, Paul Bedjan û gelek rewşenbîrên dî peyda bûn. Van kesayetîyan gelek berhemên jibo kenîsê giranbiha çap kirin

û edebê Suryanî zindî kirin (Mooken, 2003, 111-112). Wekî li jorî dîyar dibît di nîva dûyê ya sedsala 19ê da Petrîkîya Keldanîyan bi harîkarîya Papa û Dewleta Frensî şîya xwe ji nû ve saz biket û bi awayekî îstîqrarî sînorên xwe li nav Kenîsa Koçanis berfireh biket. Ev çende ji raportên mîsyonerên Ingilîz da jî dîyar dibît. Mîsyonerê Ingilîz Heazell di nameya xwe ya di sala 1902ê bo Serpîskoposê Canterbury ya Birîtanyayê rêkirî da eşkera diket kû ew gundên wextekî ser bi Kenîsa Koçanisê yên li devera Bahdînan piranî derbasî Kenîsa Keldanîyan bûne. Heman kes îşaretê didet kû mîsyonerên Domînîk perwerdeyeke gelek baş diden û Mesîhîyên derbasî Kenîsa Keldanîyan bûyî ji halê xwe memnûn in (Heazell, 1913, 151-152). Di vê dema Petrîkîya Keldanîyan hêdî hêdî li hemberî Petrîkîya Koçanisê sînorên xwe fireh kirî û hejmara endamên xwe zêde kirî, li Hekarê alozîyên mezin hebûn. Jiber seferên leşkerî yên Bedirxan Begê, Mar Şem'un Abrahamê petrîkê Koçanisê (m. 1860) çend salan ji welatê xwe dûr mabû. Herwesa şer û lêkdanên 'eşîretên Nestûrî yên navxweyî an jî yên digel 'eşîretên Kurdan rewşa deverê aloz kiribû. Jiber vê çendê mîsyonerên bîyanî neşîyan heyameke dirêj seredana wê herêmê biken. Lê belê piştî peymana Berlînê (1878) mîsyoneran şîya seredana wê herêmê biken. Piştî vê çendê hejmara mîsyonerên seredana Koçanisê diken û dixwazin peywendîyan digel petrîkê wê girê biden zêde bûn. Evê çendê derfeteke nû jibo Petrîkîya Koçanisê vekir.

**Petrîkîya Nestûrîyan ya Koçanisê**

Di sala 1860ê piştî mirina petrîkê Nestûrîyan ya Koçanisê Mar Şem'ûn Abraham, li dû usûla werasetê birazê wî Mar Şem'ûn Rûel (1860-1903) wekî petrik hate teqdîskirin. Mar Şem'ûn Rûel di serdema petrîkîya xwe da bi rêka mîsyoneran peywendî digel gelek dewletan danabû. Dema li Wîlayeta Wanê di salên 1895 – 1896ê da şer û lêkdan di navbera Ermenîyan û Dewleta Osmanî da diqewimî, Osmanîyan peywendîyên Mar Şem'ûnî yên digel dewletên bîyanî danayî wekî xeterek mezin dît û piştî kêşeya Ermenîyan ji derkeftina kêşeya Nestûrîyan tirsiya. Jibo rêlêgirtina vê çendê dewletê ji alîyê xwe ve hinek tedbîr wergirtin. Behrî Beg wekî walî li Wanê hate wezîfedarkirin. Ev Walî bi tundîya xwe ya li hemberî Ermenîyan tête nasîn. Berê, jibo xurtkirina otorîteya dewletê li Hekarîyê hinek guhorînên îdarî hatine kirin, mûçe li petrîkî hate girêdan û ew bi hinek nîşanan ve hate teltîfkirin (Arvas, 2010, 123-125). Lê belê evan tiştan neşîya peywendîyên petrîkî digel mîsyoner û nûnerên dewletên bîyanî bibirît. Di sala 1891ê hinek ewrakên ji alîyê Ermenîyan ve bo petrîkî hatine hinartin ji alîyê Dewleta Osmanî ve hatine girtin (BOA, Y.MTV. 49.38.1). Herwesa di îlona 1892yê hinek nameyên petrîkî jibo melîkên Nestûrîyan hinartî hatine girtin. Ev nameyên Suryanî ji alîyê pismamê petrîkî Nemrûd Efendî ve bo tirkî hatine wergerandin (BOA, İ.HUS. 4.16.6). Walîyê Wanê Behrî Beg di nivîsa xwe ya bo Bab-i 'Alî rêkirî, dibêjît kû Nemrûd Efendî û Melîk Simahîlê Tîyarî bûne alîgirên Dewleta Osmanî û Nestûrî bûne du bere. Alîyek tagirê Mar Şem'ûn Rûel û alîyek jî tagirê Nemrûd Efendî ye (BOA, İ.HUS. 4.16.6). Her çend Mar Şem'ûn Rûel haşayî kir û got ev nameye min nenivîsîne jî di encama tehqîqatê da dîyar bû ku name ji destê wî derketîne (BOA, BEO. 86. 6446; BOA, BEO. 77. 5731). Dema Melîk Simahîl pêgirîya xwe bo walî dîyar kirî, Mar Şem'ûn xwe ji wî gelek 'aciz kir. Li ser vê çendê Melîk Simahîl, nameyeka bi zimanê Ingilîzî ya ji alîyê mîsyonerên Emrîkî ve jibo wî hatîye hinartin teslîmî rayedarên dewletê kir (BOA, Y.MTV. 69.77.1). Li ser van rûdanan Mar Şem'ûn gelek tengav bû. Lê belê vê carê, hêj petrîk nehatî mehkemekirin, nameyeka dî ya wî ya jibo Rûsyayê hatî nivîsîn û hêj nehatî rêkirin li sala 1893yê hate girtin (BOA, Y.MTV. 73.195.2; BOA, BEO. 132.19868.2; BOA, Y.A.HUS. 278.16.2). Mar Şem'ûn yekcar tengav bû û mecbûr ma cabê bidete rayedarên dewletê ku dê xwe teslîmî hukumetê biket ( BOA, Y.A.HUS. 275.119.1; Y.A.HUS. 278.16.2). Her çend petrîk li Elbakê hate mehkemekirin jî jiber nezaketa rewşê çi ceza lê nehate birîn û piştî hinek tewsîye û şîretan jibo carekê serbest hate berdan (BOA, Y.A.HUS. 278.32.2; BOA, BEO. 251.18751; BOA, Y.A.HUS. 278.32.001). Herwesa jibo qahîmkirina pêgirîya wî bo dewletê bi mûçe û nîşanê ve hate taltîfkirin (BOA, A.MKT. MHM. 669.5; BOA, A. MKT. MHM. 669.3).

Wekî ji agahîyên jorî dîyar dibît peywendîyên Mar Şem'ûn Rûel û Dewleta Osmanî gelek xirab bûne û petrîk keftîye jêr fişarên Walîyê Wanê Behrî Begê. Li ser vê çendê petrîk naçar

bû nameyekê bo Serpîskoposxaneya Canterbury ya li Birîtanyayê rêket û harîkarîya hukumeta Ingilîzî bixwazît. Petrîk di vê nameya xwe da daxwaz diket kû wekîlekî Nestûrî li Bab-i ‘Alî bête bicihkirin û musa’ede bête dan da bîşêt yekser digel Bab-i ‘Alî muxabere biket. Li dû gotinên petrîkî, terzê rêveberîya Walî Behrî Begê rê nadet Mar Şem’un bi diristî cema’eta xwe rê ve bibet. Herwesa çareserkirina kêşeyên cema’eta Nestûrîyan erka Mar Şem’ûnî ye. Lê belê ev erke bi Nemrûd Efendîyê dijî wî hatîye raspartin û bi her awayî piştevanîya Nemrûd Efendî têt e kirin. Mar Şem’ûn di berdewamîya nameya xwe da dibêjît ku endamên meclîsên mehellî yên Nestûrî, bi dilê Nemrûd Efendî û rayedarên dewletê yên mehellî ve têne dîyarkirin û çi pûte bi Mar Şem’ûnî nahête dan (BOA, A.MKT.MHM. 533.19.5). Hukumeta Birîtanyayê ev daxwazên petrîkî gehandine Dewleta Osmanî. Li ser vê çendê Bab-i ‘Alî, Behrî Beg ji vê çendê agehdar kir û cewab jê xwest. Walî di bersiva xwe da îşaret bi hindê da ku Mar Şem’ûn kesekî ruhanî ye û kesê rê li ber gêrana karê wî yê ayînî negirtîye. Lê belê dema petrîk karê xwe yê ‘eslî berdidet û bi polîtîkayê ve meşxûl dibît, hîngê muse’eda vê çendê nahête kirin. Herwesa Behrî Beg, bi berfirehî behsê çalakîyên Mar Şem’ûn û mîsyonerê Ingilîz Browne diket (BOA, A.MKT.MHM. 533.19.6; BOA, Y.MTV. 108.22.2; BOA, Y.PRK.UM. 30.10).

**Di Petrîkîya Koçanisê ya Nestûrî da Dubendî**

Di dehsalên dawîya yên sedsala 19ê da di nav mala petrîkê Koçanisê da duberaneyeke dijwar peyda bû. Nemrûd û birayên xwe kurên İshaqê mamê Mar Şem’ûn Rûel bûn. Li dû usûla werasetê birayê Nemrûd Efendî, Mar Abraham di sala 1884ê wekî namzedê petrîkî (nazarîte) hatibû teqdîskirin û piştî Mar Şem’ûn Rûel, Mar Abraham da bibîte petrîk. Lê belê piştî peywendîyên petrîkî û Nemrûd Efendî xerab bûyî, Mar Şem’ûn dil nebû Mar Abraham biket petrîk (Abona, 2008, 135-136). Nemrûd Efendî wekî mirovekî zana û pêbawer dihate nasîn. Wî, digel rêveberên Osmanî û mezînên Kurdan peywendîyên gelek baş hebûn û mala wî ya li Koçanisê her daîm bi mêvanan tijî bû. Ji bilî zimanê suryanî zimanê kurdî û tirkî jî gelek baş dizanî. Nemrûd Efendî jiber van xususîyetên xwe di nav civaka Nestûrî da pêş keft û hate nasîn. Herwesa Walîyê Wanê li hemberî Mar Şem’ûn Rûel, Nemrûd Efendî derêxist pêş û karên ayînî tê ne, karên dî yên îdarî yên Nestûrîyan raspartine wî. Di sala 1895ê Nemrûd Efendî û Metranê Şemdînan Îshaq wekî endamên meclîsa îdarî hatine te’yînkirin û mûçe lê hate girêdan (BOA, DH.MKT. 337.73.1). Herwesa Nemrûd Efendî reîsîya mehkema bîdayetê kir (Arvas, 2010, 147) û di çareserkirina arîşeyên civakî da roleke mûhîm gêra (BOA, DH.ŞFR. 194.42). Mar Şem’ûn Rûel, bi mîsyonerê Ingilîz yê li Koçanisê niştecih Browne ve hereket dikir. Bi rêka wî peywendî digel Hukumeta Birîtanyayê danabû û dixwest bi harîkarîya Ingilîzan ve hinek tiştan dest xwe ve bînît. Dewleta Osmanî hez dikir bi Nemrûd Efendî ve hevsengîyek bête diristkirin û radeyek bo peywendîyên Mar Şem’ûnî yên digel dewletên bîyanî bête danan. Li dû raporta Konsolosê Ingilîz Elliot ya 1897ê hatîye amadekirin, di serdemê Behrî Begê walîyê Wanê da, li hemberî Mar Şem’ûn Rûel pismamên wî ji alîyê Osmanîyan ve hatine piştevanîkirin (Görür, 2019, 488, dp. 73). Herwesa Nemrûd Efendî bi xwe jî dibêjît ku li ser daxwaza Behrî Begê meyla xwe daye Kenîseya Katolîk (BOA, DH.TMİK.M. 140.52.26). Ji bilî vane jî ji nivîseka Petrîkê Keldanîyan Emanûel Tûma (1900-1947) ya bo Bab-i ‘Alî hinartî, dîyar dibît ku her di serdema Mar Elîya Abû el-Yonan (1879 - 1894) da bi izn û muse’eda dewletê, Keldanîyan dest bi xebatê kirine û gelek Nestûrî kirine Katolîk (BOA, DH.TMİK.M. 195.33.8).

Wekî ji van belgeyan dîyar dibît di dema rûdanên Ermenîyan da (1895-1896), Dewleta Osmanî ji layê xwe ve bo nederkeftina meseleyeke Nestûrî, xwestîye peywendîyên Mar Şem’ûn Rûel yên digel bîyanîyan bibirît û bi Nemrûd Efendî ve hevsengîyekê di nava civaka Nestûrî da dirist biket. Jibo vê çendê jî berê hinek Nestûrîyan daye Kenîsa Keldanîyan. Petrîkîya Keldanîyan ev derfete ji dest xwe neda û bi harîkarîya Nemrûd Efendî qeşeyên Keldanî li nav Nestûrîyên Hekarîyê dest bi xebatê kirin (Abona, 2008, 135-138). Piştî heyameke kurt kêşekêşa Mar Şemûn Rûel û Nemrûd Efendî bû kêşekêşa Ingilîz û Frensîyan. Di sala 1898ê da mîsyonerekî Katolîk yê bi navê Per De Frans hate Hekarîyê û bi harîkarîya Nemrûd Efendî dest bi xebatê kir (BOA, Y.PRK.ASK. 144.84; BOA,

A.MKT.MHM. 642.2). Piştî vê tarîxê ji salnameyên Osmanî dîyar dibît ku li Wanê, Culemêrgê, Ûrmîyê, Selmasê û Geverê gelek qeşeyên ser bi Petrîkîya Keldanîyan kar diken (Seyfeli, 2005, 111-1117). Mîsyonerên Frensî hêvîyeke zêde hebû ku heke bizav bête kirin dê bi saya nufûza Nemrûd Efendî gelek Nestûrî bibine Katolîk. Wan bi vê meremê li bajarê Wanê navenda mîsyonekê vekirin û xebatên xwe ji wê derê bi rê ve birin (Abona, 2008, 143). Mar Şem'ûn Rûel û Ingilîz ji bizav û çalakîyên mîsyonerên Katolîk gelek 'aciz bûn û bo rawestandina wan, hinek tedbîr wergirtin. Mûcîbî vê çendê hinek şîkayetname bo rayedarên Osmanî hatine hinartin û tê da hate dîyarkirin ku Nemrûd û qonsolê Frensî yê Wanê li nav xelkî paran belav diken û xelkî dibene li ser mezhebê Katolîkîyê (BOA, DH.TMİK.M. 67.72.3; BOA, DH.ŞFR. 257.100). Li ser van rûdanên dawîyê Ingilîzan biryar dan, navenda mîsyona xwe ya li Ûrmîyê veguhêzin bajarê Wanê.

Piştî li Wîlayeta Wanê û Senceqa Hekarî hejmara Nestûrîyên meyla wan li ser katolîkîyê zêde bûyî Nemrûd Efendî û alîgirên wî biryar dan ku biçin Mûsilê û beşdarî Kenîsa Keldanîyan bibin. Nemrûd Efendî bi çil pênceh mezînên Nestûrîyên Hekarîyê ve gehişte Mûsilê û jibo derbasbûna Kenîsa Keldanîyan murace'et kir. Jiber ku komekê murace'et kiribû, Kenîsa Keldanîyan rayedarên Osmanî yên Mûsilê ji vê çendê agahdar kirin. Wîlayeta Mûsilê 6î Adara 1903yê nivîsek bo Bab-i 'Alî rêkir û tê da dîyar kir ku Nemrûdê ji ruesayên Tîyarîyan bi çil pênceh zelaman ve hatîye Mûsilê, vêgavê li mêvanxaneya Petrîkîya Keldanîyan mêvan in û dixwazin biçin ser vê kenîsê. Di berdewamîya nivîsê da îşaret pê tête dan ku Nestûrî ji zû da were di bin nufûza Ingilîzan da ne û heke niha jî derbasî Kenîsa Keldanî bibin hîngê jî dê bikevin li bin nufûza Frensîyan (BOA, DH.TMİK.M. 140.52.2). Bab-i 'Alî, Wîlayeta Wanê ji vê çendê agehdar kir. Wîlayeta Wanê di bersiva xwe ya 22yê Adara 1903yê da got ku: "Nemrûd, pismamê Petrîk Mar Şem'ûnî ye, mirovekî aqil e û jibo hukumetê sadiq e. Ji berê ve tête zanîn ku muxalîfê Mar şem'ûnî ye û bûye Katolîk. Ji berî niha hatibû bihîstin ku dê biçîte Mûsilê û bibîte Katolîk. Bi xwe di nava Nestûrîyan da gelek kesên meyla wan li ser Katolîkîyê hene" (BOA, DH.TMİK.M. 140.52.5). Ji vê nivîsê da baş dîyar dibît ku bi merema katolîkbûnê çûna Nemrûdî bo Mûsilê li Wîlayeta Wanê hîç nebûye sebebê çi endîşe an jî fikaran. Lê belê di vê navberê da ji nişka ve mirina Mar Şem'ûn Rûel û helbijartina petrîkê nû, rewş serûbin kir.

**Mirina Mar Şem'ûn Rûel û Helbijartina Petrîkê Nû**

Piştî Nemrûd Efendî ji Koçanisê derkeftî û ber bi Mûsilê ve çûyî, Mar Şem'ûn Rûel bîrazayê xwe Benyamînê 16 salî di 15î Adara 1903yê wekî metran teqdîs kir. Paşî di heman rojê da Benyamîn kire Natar Kursî yanî namzedê petrîkîyê yê piştî mirina Mar Şem'ûnî. Eve dihate wê me'ne ku piştî mirina Mar Şem'ûn êdî li şûna Abrahamê birayê Nemrûd Efendî, Benyamîn dê bibîte petrîk. 29î Adara 1903yê Mar Şem'ûn Rûel li Koçaniseê wefat kir (Heazell, 1913, 158-162). Bi rêka telgrafa 1ê Nîsana 1903yê ji alîyê walîyê Wanê Tahir Paşa ve hatî rêkirin Bab-i 'Alî ji mirina petrîkî hate agehdarkirin (BOA, DH.ŞFR. 304.14; DH.MKT. 681.32.2). Nemrûd Efendî, li hemberî van rûdanên pêşbînînekirî şaş bû. Li dû agahîyên Mar Elîya Abona yê Elqoşî, malbata Nemrûdî digot "sed xwezî em niha li Koçanisê ban. Petrîkî bi sanahî da bo me bimînît" (Abona, 2008, 143). Li dû gotina heman nivîskarî, piştî Walîyê Wanê ji mirina Mar Şem'ûnî hatîye agahdar kirin, jê hate xwestin ku bo hinartin û gehandina Metranê Şemdînan bo Koçanisê ferman li Qaymeqamê Şemdînan bête kirin. Di rêûresmê teqdîskirina petrîkê nû da, jibo rêvebiribana ayînê hebûna Metranê Şemdînan şert bû. Dema Nemrûdî ev çende zanî telgrafek jibo Walîyê Wanê rêkir û jê xwest ku înandina Metranê Şemdînan bête paşêxistin û heta ew (Nemrûd) digehîte Koçanisê çi petrîk nehêne helbijartin. Li dû gotina Abona, Walîyê Wanê ji vê telgrafa Nemrûdî gelek 'aciz bûye û piştî ku zanîye ew Katolîk e, gotîye madem ew ji mezhebekî cûda ye bo çi xwe têkelî helbijartina petrîkê Nestûrîyan diket. Jiber vê çendê jibo pêknehatina daxwaza Nemrûdî, walî biryar da ku karên petrîkbûna Benyamîn bi destekî sivik bêne kirin (Abona, 2008, 141-142). Di 3yî Nîsana 1903yê bi rêka telgrafeka ji Culemêrgê hatîye hinartin, Bab-i 'Alî hate agehdarkirin ku Benyamîn wekî petrîkê nû yê Nestûrîyan hatîya helbijartin (BOA, BEO. 2077.155711). Li dû agahîyên mîsyonerên Ingilîzan yên li Koçanisê

Metranê Şemdînanê di 10ê nîsanê gehiştîye Koçanisê û 12î nîsanê jî Benyamîn wekî petrîk hatîye teqdîskirin (Heazell, 1913, 165). Lê li dû telgrafa 16ê nîsanê Metranê Şemdînan bi xwe bo Bab-i ‘Alî hinartî da dibêjît ku bi tifaqa ruhanîyên Nestûrîyan, 13yî nîsanê Benyamîn bi sifetê Mar Şem’ûn wekî petrîk hatîye teqdîskirin (BOA, DH.TMİK.M. 140.52.14). Herwekî ji van belgeyan da dîyar dibît berî diristkirina rêûresmên teqdîskirina petrîkî yên 12/13 nîsanê, hêj 3yî nîsanê hukumet hatîye têgehandin ku Benyamîn wekî petrîk hatîye helbijartin. Bi vî awayî hêj berwext agahîya helbijartina petrîkê nû hatîye ragehandin, hêvîya Nemrûdî zû hatîye şkandin û rê li ber bizavên wî hatine girtin.

Walîyê Wanê yê wî demî Tahir Paşa gelek dostê mîsyonerên Ingilîz bû. Ne mumkîn e mirov bişêt piştrastîyê bi gotinên Abona yên derbarê Walî û Nemrûdî da biket. Ne ku piştî telgrafa Nemrûdî, walî ji nû zanî Nemrûd Katolîk e û gotîye çi şola wî bi helbijartina petrîkê Nestûrîyan nîne. Çimkî her wekî me li jorî jî behs jê kirî her dema Nemrûd taze çûye Mûsilê, Walîyê Wanê bi aşkerayî dibêjît ku Nemrûd ji berê da bûye Katolîk. Jiber vê çendê em dişên bibêjin ku lezandina pêkînan û encamdana karûbarên helbijartina petrîkê nû encama xebata mîsyonerên Ingilîz yên li Koçanis û Wanê çêbûye. Dema Mar Şem’ûn Rûel mirî, birayê Nemrûdî namzedê petrîkîyê Abraham li Koçanisê amade bû û li dû qanûna kenîsê heqê petrîkîyê yê wî bû. Lê belê Ingilîzan nedixwest petrîkê nû ji dest xwe ber den û birayê Nemrûdê nêzîkî yê Keldanî û Frensîyan bête helbijartin. Ingilîzan ji amadenebûna Nemrûdî li Koçanisê îstîfade kirin û bi harîkarîya Tahir Paşayê walîyê Wanê bi şiklekî lezgînî Benyamîn wekî petrîk helbijartin. Harîkarîya Tahir Paşa gelek mûhîm bû. Jiber ku ji alîyê Bab-i Alî ve redkirina hemî îtîraz û daxwazên Nemrûd û Keldanîyan da helwesta walî roleke dîyarker gêraye. Benyamîn her ji biçûkîyê heta hîngê jêr pererde û çavdêrîya mîsyonerê Ingilîz Browne mezin bibû. Wî û xwîşka xwe Surme Xanimê perwerdeyeke taybet ji Browne wergirtibûn û hînî zimanê Ingilîzî bibûn. Ew, jibo petrîkîyê hatibû amadekirin û Ingilîzan hîç nîyet nebû ev çend keda wan bi avê da biçît û namzedê Katolîkan bibît petrîk.

**Hewlên Betalkirina Helbijartina Petrîkê Nû**

Li ser van rûdanan Abrahamê birayê Nemrûd Efendî ji Koçanisê derkeft û 4î nîsanê gehîşte Mûsilê. Li dû nivîsa Wîlayeta Mûsilê bo Bab-i ‘Alî hinartî, Abraham jî gehiştîye cema’eta digel Nemrûd Efendî û dixwazin derbasî Kenîsa Keldanîyan bibin. Di nivîsê da tête gotin ku Keldanîbûna Nestûrîyan her çend wan ji bin nufûza Ingilîzan derbêxît jî herwesa wan diêxîte di bin nufûza Frensîyan (BOA, DH.TMİK.M. 140.52.6). Li ser vê çendê di 16ê nîsanê da Bab-i ‘Alî nivîsek hem bo Wîlayeta Wanê û hem bo Wîlayeta Mûsilê rêkir û tê da dîyar kir ku her çend di Dewleta Osmanî da mezheb guhortin serbest jî bît, ne mumkîn e mezhebguhorîna ‘eşîretekê ya bi komî bête qebûlkirin (BOA, DH.TMİK.M. 140.52.4). Wîlayeta Wanê di cewaba xwe da dîyar kir ku yên çûyî Mûsilê her ew in ewên berê da bûyî Katolîk û wekî li Mûsilê belav bûyî çi agahîyên derbarê mezhebguhorîna ‘eşîretekê nehatîye bihîstin (BOA, DH.TMİK.M. 140.52.9). Herdû wîlayet jî di nivîsînên xwe da hemfikr in ku petrîkî heqê Metran Abrahamî ye. Lê belê digel vê çendê wan wesa hizir dikir heke mezhebguhorîn zêde bibît arîşeyên mezintir dê derkevin û jiber vê çendê divêt rê nehête dan bo mezhebguhorîna bi komî. Jiber vê çendê Nemrûd Efendî û hevalên xwe mecbûr man dîsa vegerin Koçanisê (BOA, BEO.2051. 153803; BOA, BEO. 2061. 154503.1).

Piştî helbijartina Mar Şem’ûn Benyamînî, ji layê Nestûrîyên alîgirê Nemrûd û Kenîsa Keldanîyan ya Mûsilê ve jibo betalkirina helbijartinê gelek muhawele hatine kirin. Daxwaznameya Petrîkê Kenîsa Keldanîyan Emanûel Tûma ya 14î nîsanê daye Wezareta Daxilîye gelek mûhîm e. Di vê daxwaznameyê da tête gotin ku li mûcîbî îrade-î senîyeyeke 14 sal berî niha derçûyî, rê hatîye vekirin Nestûrî bişên mezhebê xwe biguhorin û bibin endamê Kenîsa Ortodoks ya Rûsî hîmaye diken an Kenîsa Protestan ya Ingilîz hîmaye diken an jî Kenîsa Katolîk ya Frensî hîmaye diken. Ev mezhebe hemî jêr hîmayeya dewletên bîyanî ne. Tinê Serpîskoposxana Keldanîyan ya Katolîk yekser girêdayî Dewleta Osmanî ye. Hem ji ber vê çendê hem jî jiber ku mezhebê Nestûrîyan yê resen Keldanîyatî ye, Keldanîbûna Nestûrîyan jibo sîyasa dewletê baştir e. Lê belê li şûna ku rê li ber Nestûrîyan bête vekirin da bibine Keldanî, rêvebirên

mehellî astengan bo vê çendê derdiêxin û nahêlin (BOA, DH.TMİK.M. 140.52.20). Ji bilî vê di nava Nestûrîyan da jî hinek kesan daxwaza betalkirina petrîkîya Mar Şem'ûn Benyamîn kirin. Ji vane bi navê Berxoyê reîs 'eşîretê Dêzî û wekîlê 'eşîreta Tuxubî digotin ku helbijartina petrîkî li dû usûlê nehatîye kirin û zarokekî 16 salî neşêt wekî Mar Şem'ûn kar biketin. Jiber vê çendê daxwaza hindê kirin; an Petrîkîya Nestûrîyan bikevît jêr berpisîya Kenîsa Keldanîyan an jî birayê Nemrûd Efendî wekî petrîk bête qebûlkirin BOA, DH.TMİK.M. 1159.22.1; BOA, DH.TMİK.M. 140.52.11; BOA, BEO. 2164.162293). Lê belê ev daxwaz hemî ji layê dewletê ve hatine redkirin. Di redkirina van daxwazan da beyanên Wîlayeta Wanê ya digot petrîkîya Mar Şem'ûn Benyamînî bê arîşe û bê dudilî li nav Nestûrîyan da hatîye qebûlkirin dîyarker bû (BOA, BEO. 2183.163589; BOA, DH.TMİK.M. 159.22.2). Nemrûd Efendî di 18î tîrmehê seredana Walîyê Wanê kir û gelek gazinde jê kirin. Di axiftina xwe da gote walî, li ser daxwaza Behrî Begê walîyê Wanê yê berê meyla xwe dabû Katolîkîyê. Petrîkî heqê birayê wî bû. Lê belê îstîqbala wî hate mehwkirin û li şûna wî Benyamînê hêj zarok bû petrîk (BOA, DH.TMİK.M. 140.52.26). Ji vê çendê tête têgehiştin ku di wextî da jibo hevsengîyek li hemberî Ingilîzan bête diristkirin hinek soz li wî hatine danê. Lê belê Tahir Paşa ev hevsengîye jibo başîya Ingilîzan ve xirab kir.

Nemrûd û Kenîsa Keldanîyan ji betalbûna petrîkîya Mar Şem'ûn Benyamînî bêhîvî bûn û mecbûr man petrîkîya wî qebûl biken. Piştî vê çendê xebatên xwe yên li nav Nestûrîyan xurtir kirin. Lê belê li hemberî vê çendê jibo qeşeyên ji alîyê Kenîseya Keldanî ya Mûsilê hatine wezîfedarkirin ku xizmetguzarîya ayînî jibo Katolîkên li Wan û Culemêrgê biken rê nehate dan. Li dû nivîsên ji Wîlayeta Wanê bo Bab-i 'Alî hatine hinartin li wan deveran hîç Katolîk nîne. Her çend Nemrûd Efendî bibû Katolîk jî niha Nestûrî bi çavê mûrtedî li wî dinêrin û kes berê xwe nadetê. Di nivîsê da têtê gotin ku Nemrûd Efendî aqilcihû ye û divêt bi wezîfeyeka musasib ji deverê bête dûr kirin (BOA, DH.TMİK.M. 140.52.26; BOA, BEO. 2129.159672). Herwesa dihate xwestin ku Nemrûd, digel qeşeyên Katolîk û mîsyonerê Frensî Pêr de Frans li nav Nestûrîyan xebatên xwe zêde kirine û ev çende nakokîyê di nav Nestûrîyan da mezin diket. Jiber vê çendê divêt Nemrûd zûka ji deverê bête dûrkirin (BOA, BEO. 2125.159339; BOA, DH.ŞFR. 309.117). Di nivîsek dî da jî têtê gotin ku Nemrûd û qeşeyekî Katolîk çalakîyên bi guman diken, lê li hemberî vê çendê Mar Şem'ûn Benyamîn li dû teblîxatên hukumetê bizavê diket û ji roja bûye petrîk pê ve birayê xwe rêkiriîye di nav 'eşîretên Nestûrî û îbraza sedaqetê diket (BOA, BEO. 2684.201252.008). Her wekî di nîvîsan da dîyar dibît uslûba derbarê Nemrûd Efendî hatîye bikarînan bi yekcarî guhorîye. Berê wekî mirovekî aqil û bo dewletê sadiq dihate nasandin. Lê belê niha wekî mirovekî aqilcihû û xerabîker têtê teswîrkirin. Li ser derêxistina qeşeyên Katolîk bi heceta nebûna Katolîkan li wîlayetê, qonsolxaneya Frensî kefte liv û tevgerê. Wan dîyar kirin ku mîsyonerê Ingilîz Browne 13 sal e li nav Nestûrîyan xebatê diket. Bo çi wî ji wîlayetê dernaêxin? Di bersiva Frensîyan da hate gotin, jiber ku Browne xwe têkelî kar û barên Nestûrîyan naket û çi xebatê bo guhortina mezhebê Nestûrîyan naket hewce nîne wî derêxin (BOA, DH.TMİK.M. 59.22.7). Wesa dîyar e di nava rayedarên Osmanî da yê bi başî behsê Browne diket tekane Tahir Paşa ye. Walîyê Wanê bi israr bi heceta nebûna Katolîkan li deverê berdewamî da derêxistina qeşeyên Katolîk. Lê belê di nivîsînên wîlayetê yên dema mirina Mar Şem'ûn Rûel û yên berî destpêkirina munaqeşeyên derbarê helbijartina petrîkî da bi awayekî eşkera dihate gotin ku li nav Nestûrîyan da gelek kesên bûne Katolîk hene. Dîsa li van nivîsînan hatibû dîyarkirin ku li deverê gelek qeşeyên ji alîyê Kenîseya Keldanî ya Katolîk ve hatî hinartin kar diken. Li dû agahîyên Xurî Hurmiz yê karên ayînî yên Keldanîyên Katolîk yên li bajarê Wanê niştecih bi rê ve dibet hatine wergirtin, li wîlayetê 3300 Keldanîyên Katolîk hene (BOA, DH.TMİK.M. 140.52.11). Her wesa di salnameyên dewletê da jî dîyar dibît ku li sala 1899ê wê ve qeşeyên Keldanî li vê derê kar diken (Seyfeli, 2005, 111-117).

## Bizavên Emanûel Tûma (1900-1947) û Mar Şem'ûn Benyamîn (1903-1918)

Mar Şem'ûn Benyamîn kurê Eşaîyê birayê Mar Şem'ûn Rûel bû. Dema bûye petrîk tûşî mûxalefetaka tund ya Nemrûd Efendî û Kenîsa Keldanîyan hat. Lê belê bi harîkarîya Serpîskoposxaneya Canterbury ya Birîtanya,

Walîyê Wanê Tahir Paşa û taybetî bi harîkarîya Browne ve, muxalefeta li hemberî xwe tefand û otorîteya xwe sepand. Di çend salên pêşîyê ya petrîkîya xwe da hem wî hem jî mîsyonerên Ingilîz hindî jê hatî digel rayedarên Osmanî hemaheng hereket kirin. Taybetî mîsyonerên Ingilîz bi ser navê wî rapor û şîkayetname gehandine rayedarên dewletê û tê da her hewleke Katolîkan wekî bizaveke navbirina mezhebê Nestûrîyan an jî hewlên mezhebguhorîna Nestûrîyan dane nîşan. Bi vî awayî meydan li ber Katolîkan teng kirin. Li ser vê çendê di dawîya sala 1906ê Serpîskoposxana Keldanîyên Katolîk şîkayetnameyek bo Bab-i ‘Alî rêkirin û tê da dîyar kirin ku mîsyonerê Ingilîz Browne yê li Koçanisê niştecih, di navbera Keldanîyan û Mar Şem’ûn Benyamînî da tefrîqayê dirist diket. Bab-i ‘Alî rastîya vê çendê ji Wîlayeta Wanê pirsî. Wîlayetê li hemberî vê di cewaba xwe da got ku qeşeyên Kenîseya Keldanîyan rêkirî, bizavê diken da Nestûrîyan biken Keldanî û Nemrûd jî harîkarîya wan diket. Herwesa di nameyê da dihate dîyarkirin ku Browne, xwe têkelî mezhebê Nestûrîyan naket û tinê jibo perwerdekirin û pêşvebirina Nestûrîyan xwe weqif kirîye (BOA, DH.TMİK.M. 195.33.5,7; BOA, BEO. 3106.232911). Wekî ji van agahîyan dîyar dibît Kenîseya Keldanîyan jiber harîkarîya mîsyonerên Ingilîz û Tahir Paşa yên pêşkêşî Nestûrîyan dikir li hemberî Kenîsa Nestûrîyan ya Koçanisê şkestin xwar. Piştî vê Petrîkê Kenîsa Keldanîyan ya Katolîk Emanûel Tûma 25î gulana 1906ê nameyeke dirêj jibo Nezareta ‘Edlîye û Mezahîban nivîsî. Ev name jibo têgehiştina mentiqê milmilaneya di navbera herdû kenîsan da gelek girîng e. Name wiha dibêjît:

“Cema’eta Keldanîyan ji layê cinsîyet û millîyetî yek in. Lê belê ji layê mezheb û terzê jîyanê ve dibine du qism: qismek ji me Keldanî Katolîk û qismê dî Keldanî Nestûrî ne. Keldanî li deverên avedan dijîn. Lê belê li hemberî vê Nestûrî li deverên çîyayî wekî ‘eşîretan dijîn. Piştî Nestûrîyên li deverên Zaxo, Akrê, Zêbar û Amêdîyê bûne Katolîk, bi xêra mektebên (qutabxaneyên) li nava wan da hatî vekirin terzê jîyana Nestûrî hêlan, bûne hemwelatîyên mûtî’ê emrê dewletê û her berpirsîya dikevît li ser milên xwe bi cih înan. Di serdemê petrîkê me yê berê Elîya da (1878-1894) hinek mezinên Nestûrîyan murace’eta wî kirin û xwestin bibin Keldanî. 17 sal berî niha ji alîyê dewletê ve rê hate dan ku Nestûrî mezhebê xwe biguhorin û bibin Keldanî. Ji hîngê wê ve gelek Nestûrîyan mezhebê xwe berdan û bûne Keldanî. Vane terzê jîyana xwe ya bedewî berdan huwîyeteke medenî wergirtin. Petrîkê berî min ‘Ebdyeşû’ (1894-1899) jî ev xebatene berdewam kirin. Li hinek gundên wan mekteb hatin vekirin û bi rêkirina qeşeyan rêûresmên ayînî hatin gêran. Bi vî awayî gelek kes li nav Nestûrîyan bûne Keldanî. Serokê mîsyonerên Protestan Browne dema dîtî Keldanîyatî li nav Nestûrîyan gelek xweş belav dibît û keda wî ya di bîst salan da li Koçanisê dayî berhewa dibît, bi Mar Şem’ûn Benyamînê ji çar pênc salîyê wê ve perwerde kirî û mezin kirî û niha kirî petrîk, derheqê me da şîkayetan didet kirinê. Li dû nivîsa ji Wîlayeta Wanê hatî, têtê dîyarkirin ku xema Browne tinê muhafazakirina mezhebê qedîmê Nestûrîyan e. Gelo niha sebebê terkkirina welatê xwe û li gûndekî wekî Koçanisê ji asarê medenîyetê mehrûm niştecihbûna Brownê Ingilîz, bo muhafazakirina mezhebê qedîm yê Nestûrîyan e? Elbet fikr û nîyeteke xirab di bin vî karî da heye. Tîka ye di vê meselê da rê neden walîtîya Wanê li pêş çalakîyên Kenîsa Keldanîyan bibît rêgir.” (BOA, DH.TMİK.M. 195.33.8)

Di vê belgeyê da eşkera dibît ku çalakîyên Kenîsa Keldanîyan yên li Wîlayeta Wanê bala rayedarên dewletê dikêşît. Lê belê hemberî vê çendê çalakîyên Browne nahêne dîtin. Dema walîtîya Tahir Paşa xelas dibît û piştî wî ‘Elî Riza beg dibîte walîyê Wanê êdî bi neyînî behsê xebatên Browne tête kirin. Walîyê nû di nîsana 1907ê di nivîseka xwe da dîyar diket ku Brownê 25 sal e li Koçanisê niştecih par çûye welatê xwe, niha dîsa vegerîyaye deverê û bi çalakîyên jibo dewletê xirab ve meşxûl e (BOA**,** DH.TMİK.M. 242.22).

Kenîsaya Koçanisê ya Nestûrî piştî ku çalakîyên Kenîsa Keldanîyan yên li Wîlayeta Wanê bertaraf kirî, êdî di sala 1907ê wê ve li Wîlayeta Mûsilê dest bi xebatê kir. Herwesa hinek qeşe û ruhanîyên Keldanî, gehiştine Kenîsa Nestûrîyan û li Koçanisê cihûwar bûn (Abona, 2008, 144-146). Kenîsa Keldanîyan li hemberî vê çendê muraca’etî dewletê kir. Lê belê jiber ku Dewleta Osmanî ev mezhebguhorîne wekî çalakîyeke takekesî qebûl kir, hewce nedît çi kar bête kirin. Hinek ji ev qeşeyên ji Keldanîtîyê derbasî Nestûrîtîyê bûyî vegerîyan bajarê xwe Wîlayeta Mûsilê û dest bi çalakîyan kirin. Kenîsa Keldanîyan li hemberî vê çendê reaksîyoneke mezin nîşan da. Bo numûne di sala 1908ê Elîya Abona û Cercîs Abona yên xelkê Elqoşê ji Wîlayeta Mûsilê derkeftibûn û qesta Koçanisê kiribûn. Evane di sala 1910ê da hez kirin vegerin bajarê xwe Mûsilê. Lê belê Kenîsa Keldanî qet qebûl nekir ev metrane li Wîlayeta Mûsilê niştecih bibin. Elîya Abona mecbûr ma xwe li mala Nemrûd Efendî ya li Mûsilê sitare biket (BOA, BEO.

3720.278957). Keldanîyên Mûsilê hinek nivîs bo dewletê hinartin û tê da dîyar kirin ku Mar Şem'ûn Benyamîn, jibo hinek ruhanîyên Keldanîyan rutbeyên dînî îhdas diket û bi vî rengî dixwazît wan ji çûna eskerîyê xelas biket (BOA, BEO. 3945.295863). Wekî ji van agahîyan dîyar dibît êdî Kenîsa Koçanisê dest bi bizava firehkirina sînorên xwe diket û dixwazît Nestûrîyên Wîlayeta Mûsilê yên çûne li ser mezhebê Keldanîyan dîsa vegerînît li ser Kenîsa Koçanisê. Êdî Kenîsa Koçanisê ji merhela xweparastinê derbasî merhela êrîşê bû. Petrîkîya Koçanis û mîsyonerên Ingilîz dema ku dîtin li nav Keldanîyên Wîlayeta Mûsilê da rexbetek bo wan heye û dê bişên gelek kesan bînin li ser kenîsa xwe, qena'et kirin êdî wextê bizavên mîsyonerî li Müsilê hatîye. Mîsyonerên Ingilîzan jibo bişên bi rêkûpêkî xebatên xwe yên mîsyonerîyê lê biken, xwestin li bajarê Mûsilê îstasyonekê veken. Lê belê sereray hemî bizavên xwe, neşîyan li wê derê îstasyonekê veken. Dawîyê mîsyonerên Ingilîz biryar dan, mekteba (qutabxaneya) bo perwerdeya zarokên Nestûrî ya li Wanê hatîye vekirin veguhêzin û bînin Amêdîyê li gundê Bêbadê (Heazell, 1913, 210-212). Halbukî bi sed kutek û zorî şîyabûn ruxsetê ji Dewleta Osmanî wergirin û mektebekê li bajarê Wanê ava bikin. Bi bawerîya wan Amêdîyê di navbera Wîlayeta Wan û Mûsilê da ye û dê bi sanahî bişên xwe bigehînin Nestûrîyên herdû alîyan (Abona, 2008, 146-147). Lê belê xelkê devera Amêdîyê yên Musliman, Yaqûbî, Suryanî û Yahûdî bi tundî hemberî vê çendê derkeftin û hez nekirin dewlet ruxsetê bidet mîsyonerên Ingilîzan. Şênîyên Amêdîyê bi vê meremê di xizîrana 1911ê nivîsek bo rayedarên dewletê rêkirin (BOA, DH.İD. 123.4.5, 8, 14). Di dawîyê da mîsyonerên Ingilîz şîyan ruxsetê ji dewletê wergirin û mîsyonek li Bêbadê ava kirin. Lê belê hêvîya ji vê mîsyonê dihate kirin bi cih nehat. Çunkî berî Şerê Cîhanê yê Yekê mîsyonerên Ingilîz xwe ji axa Osmanîyan vekêşan.

Di 1910an pê ve çalakîyên mîsyonerên Ingilîz û Petrîkîya Nestûrîyan ya Koçanis bala rayedarên Osmanîyan kêşan û çavdêrîyeka hûr li ser van çalakîyan hate kirin. Li dû nivîseka Osmanî ya xizîran 1911ê li dû belavbûna mezhebê Ortodoksîyê li nav Nestûrîyên devera Ûrmîyê û xurtbûna peywendîyên Rûsî digel wan, herwesa Birîtanyayê jî bizavên xwe yên li nav Nestûrîyên hemwelatîyên Osmanî zêde diket (BOA, DH.İD. 123.4.5,8,14). Dîsa her di wê salê da Nezareta Herbîye ya Osmanî balê dikêşît li ser nuqteyeka gelek girîng. Li dû neveroka vê raportê Keldanî mirovên gundî ne û li gundên xwe bi cotyarîyê ve meşxûl in. Evene pêgirê emr û fermanên dewletê ne û çi bizavên sîyasî an jî bo dewletê xeter naken. Lê belê beramberî vane, Nestûrîyên bi navê Tîyarî û Tuxûbî û hejmara wan nêzîkî 30 hezar, mirovên nezan in bi hîç şêweyekî pêgirîyê bi emr û fermanên hukumetê naken û serbixwe bizavê diken. Heke bi darê zorî û xurtîyê nebît ne mumkîn e eve otorîteya dewletê qebûl biken. Raport di berdewamîya xwe da îşaretê bi hindê didet ku Nestûrî dixwazin di siberojê da li hemderî dewletê serî hilden. Jiber vê çendê Nestûrî dixwazin Keldanîyên deştê (yên Wîlayeta Mûsilê) îlhaqî xwe biken û li ser wan zal bin. Li dû raportê taybetî mîsyonerê Ingilîz Browne yê sî sale li nav wan da dijît, xebatê diket da Nestûrîyan li dû berjewendîyên Hukumeta Birîtanyayê tehrîq biket (BOA, DH.SN.THR. 25.77). Heke nameya Petrîkê Keldanîyan Emmanuel Tûma ya wextî da bo Bab-i 'Alî rêkirî û naveroka vê raportê bête berawird kirin bi sanahî tête têgehiştin herdû jî heman ramanê radigehînin. Tûma, her jiber van egeran Dewleta Osmanî hişyar dikir û jibo rêligirtina vê çendê harîkarî ji dewletê dixwest. Belê dewleta hîngê ev çende jibo xwe wekî xeter nedidît, niha bi çavekî dî berê xwe dida rûdanan. Di vê navberê da Mar Şem'ûn Benyamîn di sala 1914ê da daxwaznameyek bo Bab-i 'Alî rêkir û tê da daxwaz kir ku bêyî helbijartin nûnerekî Nestûrîyan an li Meclîsa Mebûsana Osmanî bête bi cih kirin an jî wekî endamê 'Ayan bête qebûlkirin. Lê bele Dewleta Osmanî bi behaneya ku ev çende dijî qanûnê ye, red kir (BOA, DH.MTV. 402.14.1,3).

Hevrikî û milmilaneya di navbera herdû petrîkîyan heta berbanga Şerê Cîhanê yê Yekê berdawam kir. Di sala 1913 da Mar Şem'ûn Benyamîn nameyek bo rayedarên dewletê rêkir û tê da gazinde ji avakirina kenîseyek û mektebekê ya ji alîyê Katolîkan ve li Gundê Aşûtê yê ser bi Hekarîyê dikir (BOA, HR.SYS. 1783.60). Li ser vê çendê Dewleta Osmanî, Sefareta Frensî têgehand, ruxset nahête dan ku Katolîk bişên li Aşûtê kenîse û mektebekê ava biken (BOA, HR.SYS. 1383.70). Herwesa di

tebaxa 1914ê da Mar Şem'ûn Benyamîn di nivîseka bo rayesarên dewlêtê hinartî da dîyar diket ku Metran Mar Elîya Abona yê xelkê Elqoşê çar sal berî niha bibû Nestûrî û dema li Elqoşê wezîfa xwe ya ayînî dikir, xelkê Elqoşê şîkayeta wî kiribûn û ew jî naçar mabû birevît bête Koçanisê nik min. Di berdawamîyê da dibêjît heke qeşe û ruhanîyên Keldanî bişên li nav gundên me da kar biken, divêt Mar Elîya jî bişêt li Elqoş kar biket (BOA, BEO. 116.93.2). Li hemberî vê çendê Wîlayeta Mûsilê da zanîn ku dema Mar Elîya ji Elqoş hatî derêxistin ruxset hatibû danê ku Nestûrîyên Elqoş bo xwe qeşeyeke dî peyda biken (BOA, BEO. 4092.306894).

**Şerê Cîhanê yê Yekê û Aqibeta Herdû Kenîseyan**

Berî destpêkirina Şerê Cîhanê yê Yekê mîsyonerê Ingilîz Browne di 1913ê da li Koçanisê mir (Abona, 2008, 149-150). Wî di xebatên xwe yên dûr û dirêj yên di nav Nestûrîyan da karîgerîyeke mezin çêkiribû. Di serî da Mar Şem'ûn Benyamîn û xwîşka wî Surme Xanim ji biçûkatîyê perwerde kiribûn. Herwesa kesên di wan çend salan da ji navendên mîsyonên Ingilîzan perwerdebûyî êdî mezin bibûn. Dîyarkirina siberoja Nestûrîyan keftibû di destê ev nifşê ji alîyê Ingilîzan ve hatî perwerdekirin. Her çend mîsyonerên Ingilîz xwe têkelî mezhebê Nestûrîyan nekiribûn jî ji alîyê komelgehî ve kartêkirineke ji vê mezintir kiribûn. Nestûrîyên deverê heta hîngê xwedî nasnama xwe ya dînî û ya 'eşîrî bûn. Lê belê piştî bizavên mîsyonerên Ingilîz nasnameyeka netewî ya nû hate diristkirin. Li dû vê têgehiştinê Nestûrî nevîyên Asûrîyên antîk in û ji Gola Wanê heta Mûsilê kevne welatê wan e. Her çend ev hizr û bîre di serê hinek serkêşên Nestûrîyan da cih girtibît jî hêj di mejîyê piranîya civakê da baş cih negirtibû. Lê belê wesa dîyar dibû Nestûrîyên heta niha wekî civakeke dînî dihatin dîtin hêdî hêdî ber bi hizra netewî ve diçûn. Piştî mirina Browne çalakîyên Ingilîzan li deverê sist bûn û piştî çendekê Ingilîzan xwe yekser ji meydanê vekêşan. Heta niha Nestûrîyên deverê ji alîyê Ingilîzan ve hatibûn piştevanîkirin. Lê belê jiber kû çi hudûdên Birîtanyayê bi deverê ve nebûn, sînorê piştevanîya Birîtanyayê heta radeyekê bû. Beramberî vê çendê Dewleta Rûsî xwe nêzîkî sînorên deverê kiribû û li ser vê çendê ra Nestûrîyên Ûrmîyê piranî bibûn Ortodoks û ji alîyê Rûsan ve dihatin hîmayekirin. Jiber van egeran Kenîsa Koçanisê ya Nestûrîyan hêdî hêdî peywendîyên xwe bi Rûsan ve xurtkirin. Heta niha Ingilîzan nedihêla peywendî di navbera Nestûrî û Rûsan çêbibin. Lê belê piştî wan dever hêlayî êdî çi asteng ber vê çendê neman. Herwesa piştî 1913 Dewleta Osmanî yekser keftibû jêr kontrola Îttîhad û Tereqqîyê. Vê rêveberîyê cudahîyên dînî û yên etnîk yên di nava sînorên Osmanî da wekî xeter didît û dîyar dibû ku dê li hemberî wan polîtîkayeke tund bi rê ve bibet. Di nava sala 1914ê da çendîn raportên Dewleta Osmanî balê dikêşin li ser wê çendê ku êdî Nestûrî bi temamî keftine jêrnufûza Rûsî (BAO, DH.ŞFR. 42.44; BOA, DH.İD.169.11; BOA, DH. İD.116.57; BAO, DH.SYS. 108.39). Dema Şerê Cîhaê yê Yekê di 28î tîrmeha 1914ê dest pê kirî Osmanî hêj beşdarî şerî nebûbûn. Lê belê di 2yê tebaxê da peymaneke veşartî digel Dewleta Elmanî kiribûn. Di 3yê tebaxê Walîyê Wanê Tehsîn Paşa hevdîtinek digel Mar Şem'ûn Benyamînî çêkir û jê xwest ku Nestûrî hevkarîya Rûsan nekin û beramberî vê çendê hukumet sozê didet hinek çaksazîyan jibo Nestûrîyan pêk bînît. Petrîkî çi tiştê yeklaker neda destê walî (Surma, 1996, 70). Di destpêka şerê di navbera Osmanî û Rûsan da Nazirê Daxilîyê yê Osmanî Tel'et Paşa di 26î çirîya yekê da nivîsek bo Wîlayeta Wanê rêkir û jê xwest Nestûrî bo bajêrên Enqere û Qonyayê yên li Anedolê bêne tehcîrkirin (BOA, DH.ŞFR, 46.78). Wîlayetê di bersiva xwe ya di 29î heman mehê da dîyar kir ku jiber devera Nestûrîyan ya çîyayî û hebûna 'eşîretên Nestûrî yên şerker, pêkînana vê çendê ne mumkîn e. Dewleta Osmanî, Nestûrî êxistin jêr çavdêrîyê û bi tinê bi vê çendê ve îktîfa kirin (BOA, DH.ŞFR. 46.102).

Di destpêka 1915ê da di nava Nestûrîyan da nîqaş û hatinûçûneke zêde hebû. Dewleta Rûsî li hemberî hêzên Osmanî pêşkeftin bi dest xwe ve înabûn û xwe nêzîkî Wanê û Bidlîsê dikir. Ehalîyê van deveran yên Musliman ber bi başûr û rojavayê ve koçber dibûn. Di nava Nestûrîyan da du helwest derdikeftin pêş. Li Koçanisê di navbera Mar Şem'ûn Benyamîn û Nemrûd Efendî îxtîlaf hebû. Piştî mezinbûna îxtîlafa di navbera herdûyan da mufrezeyeke leşkerî ya Osmanî li Koçanisê hate bicihkirn. Petrîkî jiber hebûna vê mufrezê nedişîya bi rehetî peywendîyê digel Rûsan girêbidet an jî

kombûnan digel ‘eşîretên Nestûrî biket. Jiber vê çendê hebûna Nemrûd Efendî ya gundî kire hecet û got an ew dê ji gundî derkevît an ez. Dema Nemrûd Efendî ji gundî neçû di serê adara 1915ê petrîk ji gundî derkeft û çû li Gelîyê Dêzê yê asê bi cih bû (BAO, DH.ŞFR. 475.62; BOA**,** DH.EUM. 2. ŞB. 8.63). Mar Şem’ûn piştî çûye Dêzê êdî bizavên xwe xurtir lê kirin. Di meha nîsanê da piştî digel melîk û mezinên Nestûrîyan kombûnên berfireh pêkînayî, biryar hate dan Nestûrî dê digel Rûsî li dijî Dewleta Osmanî şerî biken (Surma Hanim, 1996, 74; Abona, 2008, 152). Nemrûd Efendî ji vê biryara Mar Şem’ûn û Nestûrîyan nîgeran bû. Wî hizir dikir ev biryare dê bibîte sebebê felaketa milletê Nestûrî. Lê belê yên biryara şerî dayî wesa bawer dikirin Dewleta Rûsî de her serkevît û îstîqbaleqa geş li çavrê Nestûrîyan e. Nestûrîyên şerxwaz di 15î gulanê Nemrûd Efendî û gelek kesên ji malbata wî li Koçanisê kuştin (Parhad, 2009, 31-33; Mooken, 2003, 105). Piştî vê rûdana diltezîn êdî di nav Nestûrîyan da li hemberî biryara şerî çi dengên cûda nehatin bihîstin.

Piştî dîyar bû Nestûrî dê hevkarîya Dewleta Rûsî biken, rêveberên Osmanî planeka nû ya leşkerî danan. Li dû vê planê hêj hêzên Rûsî yên leşkerî negehiştine deverên Nestûrîyan, divêt Nestûrî ji deverên xwe bêne dûrkirin. Çunkî heke harîkarîya leşkerî ya Rûsan bigehîte Nestûrîyan; hem derêxistina wan ji wê devera çîyayî zehmet dibît hem jî ew dê li ser Mûsilê bibine gefeke xeternak. Bi vê meremê Walîyê Mûsilê Heyder Begê ‘eşîretên Bahdînan û Hekarê organîze kirin û digel quweteka nîzamî di meha xizîranê da dest bi hereketa leşkerî kir û bi vî awayî navbera Nestûrî û hêzên Osmanî/Kurdan da şerî dest pê kir (BAO, DH.ŞFR. 472.87). Di dawîya meha tebaxê da Nestûrî mecbûr man xwe vekeşin deverên wekî Xoy û Salmasê yên jêrdestê Rûsî da (BAO, DH.ŞFR. 491.41). Lê di sala 1917ê li Rûsyayê şoreş çêbû û rêveberîya nû xwe ji şerî vekêşîya. Êdî Nestûrî ji harîkarîya Rûsya mehrûm man. Herwesa di 1918ê jî Mar Şem’ûn Benyamîn ji alîyê Simko Şîkakî ve hate kuştin. Bi vî awayî Nestûrîyan du şkestinên mezin xwarin. Dawîyê Ingilîzan dîsa xwe li Nestûrîyan kire xudan û ew li ser Hemedanê ra derbasî Iraqê kirin.

Dema Nestûrî derbasî Iraqê bûyî Ingilîzan bi navê arteşa Levî hêzeke leşkerî ji Nestûrîyan ava kir. Hêzên Levî jibo binecihkirina otorîteya Ingilîzan li Îraqê û tefandina hêzên Kurdan û ‘Ereban yên ji Ingilîzan nerazî roleke gelek mezin gêra. Lê belê ew li Iraqê bîyanî bûn û kiryarên wan xelkê Iraqê ji wan sar kiribû. Nestûrî ji sozên Ingilîzan piştrast bûn ku ew dê jibo wan rêveberîyeke serbixwe diris biken. Lê belê Ingilîzan çi sozên xwe yên dayî Nestûrîyan bi cih neînan û di pêvajoya lêkvekirin û serejinû avakirina deverê da ew bêpar hêlan. Dema Komara Iraqê di sala 1932yê da serxwebûna xwe wergirtî û Ingilîzan biryar dayî da ji Iraqê derkevin, Nestûrî nûka ji xwe hesîyan. Êdî li Iraqê nedvî bûn. Komara Iraqê amade bû Nestûrîyan wekî hemwelatîyên xwe qebûl biket û otorîteya Mar Şem’ûnî ya dînî qebûl biket. Lê belê Nestûrîyan xwestin li devera Behdînan jibo wan rêveberîyeke xweser bête diristkirin. Ingilîzan û Komara Iraqê ev çende qebûl nekirin. Di sala 1933yê hinek hêzên Nestûrîyan sînorê Sûrîyê derbaz bûn û xwestin bi harîkarîya Frensîyan li wê derê bêne niştecihkirin. Di vegera van hêzan bo Iraqê da şer di navbera wan û hêzên Komara Iraqê derkeft. Hêzên komarê bi tundî ser bi hêzên Nestûrîyan da çû û tevkujîyek li ser wan kir. Piştî vê çendê petrîkê Nestûrîyan nefî kirin Qibrisê û ji wê derê jî derbasî Emerîka bû. Piştî hîngê gelek Nestûrîyan Komara Îraqê hêlan û li Ewropa, Emerîka, Awusturalya, Sûrîye û Lubnanê niştecih bûn. Li beramberî vê çendê Kenîsa Keldanîyan di Şerê Cîhanê yê Yekê da çi helwestên polîtîk wernegirt û hindî jê hatî xwe ji xirabkarîya şerî parast. Petrikê Keldaniyan Emanuel Tûma, xwe ji rêveberîya Osmanîyan yaxî nekir û heta sala 1920ê jî mûçeyê xwe ji Dewleta Osmanî werdigirt (BEO.004638.347794.001; BEO.004663.349721.001). Navenda petrîkîyê ji Mûsilê derbasî Bexdayê bû. Bi vî awayî xwe li ligel rêveberîya nû guncand.

## Encam

Hatina mîsyoneran bo Rojhilata Navîn û çalakîyên wan her çend hinek mifa gehandibine Mesîhîyên xwecih yên deverê jî herwesa berevajî vê gelek xirabî gehandine wan. Çunkî mîsyonerên her dewletekê li dû berjewendîya politikaya dewleta xwe bizav dikir. Eve wê çendê radigehînît ku polîtîkayên dewletan û armancên Mesîhîyên deverê hemî caran digel yek guncaw nebûn. Kenîsa Keldanîyan ya

Wîlayeta Mûsilê an jî Kenîsa Nestûrîyan ya Koçanisê du kenîseyên biçûk yên heman ziman û heman netew in. Lê belê jiber çalakîyên mîsyonerên bîyanî gelek nakokî û arîşe di navbera wan da peyda bûn. Ji vane Kenîsa Keldanîyan ya Katolîk girêdayî Papa bû û ji alîyê Dewleta Frensî ve dihate hîmayekirin. Kenîsa Nestûrîyan ya Koçanisê zêdetir peywendî bi Dewleta Birîtanyayê ve girêdabû. Mîsyonerên Ingilîz her çend derbarê mezhebguhorîna Nestûrîyan da çi bizav nekiribin jî armanca wan ya yekê dûrkirina Nestûrîyan ji tifaqên digel Kurdan an jî Rûsan bû. Bizavên mîsyonerên Ingilîz digel polîtîkaya Birîtanyayê guncayî bû. Li dû vê polîtkayê divêt sînorê di navbera Osmanî û Îranê jibo derbaznebûna Dewleta Rûsî parastiyî bît û herdû alî otorîteya xwe ya merkezî li ser sînorên xwe bisepînin. Jiber vê çendê wan hemî caran berê Nestûrîyan dida hindê kû pêgirîyê bi otorîteya merkezî ya Osmanîyan biken.

Herdû kenîseyan jî jibo firehkirina sînorên kenîseya xwe û zêdekirina endamên xwe bizav dikir. Her çend Kenîseya Keldanîyan di destpêka xebatên xwe da ji alîyê endaman ve kêmtir jî bît, wê şîya hêdî hêdî sînorên xwe li nav Nestûrîyan da berfireh biket û Nestûrîyên li deverên Başûrê Kurdistanê bînin li ser kenîsa xwe. Di bizavên xwe da herdû kenîseyan ji dewletên semyanê xwe harîkarî didît û gelek caran mucadeleya di navbera herdû kenîseyan dibû mucadeleya mîsyonerên Ingilîz û Frensî. Li hemberî vê çendê Dewleta Osmanîyan - dema walîtîya Tahir Paşa ya Wanê tê ne-hevsengîya di navbera herdû kenîseyan an jî herdû dewletan diparast. Herdû kenîseyan bo wergirtina piştgirîya Dewleta Osmanî argumentên cuda cuda bi kar tînan. Hindî Kenîsa Nestûrî ya Koçanisê bû, wan îddîa dikir kû Kenîsa Keldanîyan ji alîyê Katolîkan ve tête piştevanîkirin û ew dixwazin mezhebê wan yê qedîm biguhorin. Beramberî vê çendê Kenîsa Keldanîyan digot ku Nestûrîyên çîyayî xudan ‘eşîretên çekdar in û pêgirîyê bi emrên dewletê naken. Ev çende bo dahatûya dewletê xirab e. Kenîseya Keldanîyan nimune li ser Nestûrîyên Başûrê Kurdistanê yên bûne Keldanî tîna û digot di encama xebatên me da xwendin û rewşenbîrî li nav wan da belav bûye û ew bûne hemwelatîyên medenî. Wesa dîyar e ku eve ne tinê argumenteke jibo qanihkirina rayedarên dewletê dihate bikarînan. Herwesa dîyar dibît Kenîseya Keldanî ji wê çendê ditirsîya ku Kenîsa Nestûrîyan ya Koçanisê bi rêka ‘eşîretên xwe yên çekdar otorîteya xwe li ser Keldanîyan bisepînît. Dema em çalakîyên ‘eşîretên Nestûrî yên piştî derbasî Iraqê bûyî li ber çavan werdigirîn, derdikevît meydanê ku ev tirse bê çinehî nebû.

Heke em helwesta herdû kenîseyên biçûk helsengînîn em dê bibînîn ku Kenîsa Koçanisê ya Nestûrîyan di serkêşîya petrîkê xwe rîskeke gelek mezin helgirt û milletê xwe kêşa nava trajedîyeke gelek mezin. Heke guhdarîya Nemrûd Efendî hatiba kirin, beşdarî şerî neba û bêlayenîya xwe parastiba, di her halekî da ev trajedî hinde giran nedibû. Kenîsa Keldanîyan pitir şîya helwesteke baştir wergirît û milletê xwe ji nemanê rizgar biket. Berî Şerê Cîhanê yê Yekê hejmara endamên Keldanîyan ji Nestûrîyan kêmtir bû. Lê belê îro hejmara endamên Kenîsa Koçanisê ji wan gelek kêmtir e. Herwesa Keldanîyan şîyan hebûna xwe li kevnewarên xwe biparêzin. Lê beramberî vê çendê Nestûrî bi yekcarî ji kevnewarên xwe derkevtin ü bûne mişext.

## Jêder

- **Jêderên Erşîva Osmanî**

Başbakanlık Osmanlı Arşivi (BOA)
Bab-ı Ali Evrak Odası Evrakı (BEO)
Dahiliye Nezareti İdare Evrakı (DH.İD)
Dahiliye Nezareti Mektubi Kalemi (DH.MKT)
Dahiliye Nezareti Şifre Evrakı (DH.ŞFR)
Sadaret Mektubi Mühimme Kalemi Evrak (A.MKT.MHM)
Dahiliye Nezareti Emniyet-i Umumiye İkinci Şube (DH.EUM. 2. ŞB)
Dahiliye Nezareti Mütenevvia Evrak (DH.MTV)
Dahiliye Nezareti Sicill-i Nüfus Tahrirat Kalemi (DH.SN.THR)
Dahiliye Nezâreti Tesrî-i Muamelât (DH.TMİK.M)
Hariciye Nezareti Siyasi (HR.SYS)
İrade Hususi (İ.HUS)
Yıldız Sadaret Hususi Maruzat Evrakı (Y.A.HUS)
Yıldız Mütenevvi Maruzat Evrakı (Y.MTV)
Yıldız Perakende Evrakı Umumi (Y.PRK.UM)

- **Jêderên Dî**

Abona, A. (2002). *Tarih'ul-Keniset'iş-Şarkiyye,* 3 Berg, Beyrut: Dar'ul-Maşrik.

Abona, M. E. (2008). *Tarihu Betariket'il-Beyti Ebevi*, (Thk. ve Trc: Bünyamin Haddad), Duhok: Dar'ul-Maşriki's-Sakafi.

Arvas, T. Z. (2010). *Hakkâri Nasturileri (1836-1936),* Yüksek Lisans Tezi, Van: Yüzüncü Yıl Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü.

Baumer, C. (2009). *Keniset'ul-Maşrik,* Çev: Aziz Emanuel Zibari, Duhok: Râbitetu'l-Kitabi ve'l-Udebai'l-Asuriyyin.

Campanile, R. P. G. (2009). *Kürdistan Tarihi*, Frnasızca'dan çeviren: Heval Bucak, İstanbul: Avesta yayınları.

Görür, E. D. (2019). "Hakkâri Sancağı'nda Nasturi Olayları (1896-1897)", *Tarih İncelemeleri Dergisi*, XXXIV/2, ss. 475-506.

Habbi, Y. (2013). *Keniset'ül-Maşrik,* Beyrut: Merkez'ul-Akademi li'l-Ebhas.

Heazell F. N. and Margoliouth D. S. (eds), (1913). *Kurds and Christians*, London: Wells Gardner, Darton and Co., Ltd.

Kaplan, Y. (2020). "Hakkâri'de Nestûrî Patrikliğinin Son Dönemi (1876-1915)". *Milel ve Nihal*, 17/2, ss. 249-280.

Kaplan, Y. (2021), *Nesturi Kilisesi'nin Temel İnanç ve Uygulamalarının Teşekkül Süreci (VI-XIII. Yüzyıllar)*, Doktora tezi, Ankara: Ankara üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü.

Mooken, M. A. (2003). *The History of the Assyrian Church of the East in the Twentieth Century*, Kottoyam: St. Ephrem Ecumenical Research Institute.

Murre-van den Berg, H. (2009). "Chaldeans and Assyrians: the Church of the East in the Ottoman Period", in Erica Hunter (ed.), *The Christian Heritage of Iraq. Collected Papers from the Christianity of Iraq I-V Seminar Days*, Piscataway NJ: Gorgias Press, pp. 146-164.

Parhad, S. (2009). *Görevin Ötesinde*, Çev: Vedii İlmen, İstanbul: Yaba Yayınları.

Seyfeli, C. (2005). "Osmanlı Devlet Salnamelerinde Süryaniler" (1847-1918), *Süryanilik ve Süryaniler*. Haz. Ahmet Taşğın, Eyyüp Tanrıverdi, Canan Seyfeli. Ankara: Orient Yayınları, ss. 49-140.

Seyfeli, C. (2018). "Keldani Patrikliğinin İdaresi ve Osmanlı Devlet Salnameleri", *SBARD*, 32/2, Güz, ss. 89-126.

Surma Hanım (1996). *Ninova'nın Yakarışı, Doğu Asur Kilise Gelenekleri ve Patrik Mar Şamun'un Katli*, İstanbul: Avesta yayınları.

Verheij, J. (2014). "Hakkâri, 'Batılılar' ve 'Nasturiler' Hakkâri'nin 19. Yüzyıl Tarihi İle İlgili Avrupa ve Amerikan Kaynakları", *Uluslararası Tarihte Hakkâri Sempozyumu (14-16 Kasım 2014),* Ankara: Hakkâri Üniversitesi yayınları, ss. 79-93.

Verheij, J. (2017). "Doğu Anadolu'da Batılı Seyyahlar 1800-1914, Açıklamalı Bibliyografya Denemesi". *Kebikeç, İnsan Bilimleri İçin Kaynak Araştırmaları Dergisi*, 44, ss. 379-420.

Vine, A. R. (1937). *The Nestorian Churches*, London: Independent Press, 1937.

Wilmshurst, D. (2000). *The Ecclesiastical Organisation of the Church of the East, 1318-1913*, CSCO 582/ Subsida 104. Lovanii: Peeters.

## The Conflict Between Nestorians (Assyrians) and Chaldeans in the Foundation of Iraq

**Abstract**

Christians constitute an important component of Iraqi society. Iraqi Christians have been settled in Mesopotamia since ancient times. Christians have historical, political, cultural and social relations with both the Iraqi people and the people of Kurdistan. This community played an important role in the establishment and in the early period political administration of the Iraqi Republic. As it is known, the Christian community in Iraq and Kurdistan; It consists of two churches with different ideas, namely the Assyrian Church of the East and the Chaldean Catholic Church. During the Ottoman period, the Chaldean Church was residing in Mosul Province and the Assyrian Church of the East in Hakkari Sanjak of Van Province. While the Chaldean Church was under the influence of the French State, the Assyrian Church of the East was under the influence of the British State. From the middle of the 19th century, a noticeable competition started between both churches and communities, and powerful states were included in this competition in accordance with their policies. In this study, the relationship and competition between these two churches and communities at the dawn of the establishment of the Iraqi State will be discussed. In addition, the root of the ongoing problems among Christian components after the establishment of the Iraqi Republic will be pointed out. In this study, more Ottoman archive documents will be used.

**Keywords**: Chaldeans, Nestorians, Assyrians, Christians, Iraq.

## Irak'ın Kuruluşunda Nesturiler (Asuriler) ve Keldaniler Arasındaki Çekişme

**Özet:**

Irak toplumunda Hıristiyanlar önemli bir bileşeni oluşturmaktadır. Irak Hıristiyanları eski dönemlerden beri Mezopotamya'da yerleşiktirler. Hıristiyanların hem Irak halkı hem Kürdistan halkı ile tarihi, siyasi, kültürel ve toplumsal ilişkileri bulunmaktadır. Bu topluluk, Irak Cumhuriyeti'nin kuruluşunda ve Irak Cumhuriyeti'nin erken dönem siyasi yönetiminde önemli bir rol oynamıştır. Bilindiği üzere Irak ve Kürdistan bölgesindeki Hıristiyan topluluğu; Doğu Asuri Kilisesi (Nesturi) (Assyrian Church of the East) ve Keldani Katolik Kilisesi (The Chaldean Catholic Church) isimli farklı görüşlere sahip iki kiliseden oluşmaktadır. Osmanlı döneminde Keldani Kilisesi Musul Vilayeti'nde ve Doğu Asuri Kilisesi Van Vilayeti'nin Hakkâri Sancağı'nda ikamet etmekteydi. Keldani Kilisesi Fransa Devleti'nin nüfuzu altında iken Doğu Asuri Kilisesi ise İngiltere Devleti'nin nüfuzu altında bulunmaktaydı. 19. yüzyılın yarısından itibaren her iki kilise ve topluluk arasında gözle görülür bir rekabet başlamış ve güçlü devletler de politikalarına uygun olarak bu rekabete dâhil olmuşlardır. Bu çalışmada Irak Devleti'nin kuruluşunun şafağında bu iki kilise ve topluluk arasındaki ilişki ve rekabet ele alınacaktır. Ayrıca Irak Cumhuriyeti'nin kuruluşundan sonra da Hıristiyan bileşenler arasında devam eden problemlerin kökenine işaret edilecektir. Bu çalışmada daha çok Osmanlı arşiv belgelerinden istifade edilecektir.

**Anahtar Kelimeler:** Keldaniler, Nesturiler, Asuriler, Hıristiyanlar, Irak.